# Zarok

Ji zarokên li malê rastî tundîyê tên re alîkarî divê.

## Encamên tundîya navmalî li ser zarokan hene

Gava zarok di nava malê de rastî tundîyê tên ew awa li ser bipêşveçûyîna wan tesîreke neyînî dike. Eger zarok yekser rastî tundîyê neyên jî ev awa rû dide.
Hindek zarok bê deng janê dikişînin, hin ên din nîşanên cuda nîşan didin. Wek nimûne: zehmetîyên li xwandingehê, şilkirina binê xwe, êşên serîyî, xerabûnên xwarinê û razanê, teşqeleyên di têkilîkirina zarokên din de yan hêrsokîbûn.

## Ev nûnertî zarokan destek dikin

Navendên şîretkarîya Destekkirina Qurbanîyan (Opferhilfe), gava zarok rastî tundîya navmalbatî tên şîretin li wan dike. Li ser Destekkirina Qurbanîyan (Opferhilfe) zanîyarîya bêtir li vê derê heye.
Xizmeta şîretkarîyê ya hînkarîya Kantona Bernê destekê dide bi saxlemî bipêşveçûyîna zarokan. Zarok û gênc li vê derê, wek nimûne di nakokîyên navmalbatî de dikarin alîkarîyê bistînin.

## Zarok dikarin çi bikin?

Zarokên li malê rastî tundîyê tên divên ji derveyê malbatê bi hin kesan re li ser vê yekê biaxifin. Wek nimûne: mamhosta, karkirên sosyan ên xwandingehê, dêûbavên hevalan yan cîranan.
Dikare bi şev û bi roj ji Pro Juventute re têlefon bê kirin. Pisporên wan ji tu kesekî din re behsa hevpeyvînan nakin. Ew li qurbanîyan guhdarî dikin û ji bo dîtina çareyan alî wan dikin. Têlefonkirinên ji Pro Juventute-yê re miftîbelaş in. Ne lazim e têlefonkir navên xwe bibêjin. Herweha bi peyama nivîskî, çetê yan emaîlê dikare bi Pro Juventute-yê re têkilî bê kirin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-bern.ch/ku/haeusliche-gewalt/kinder